

## Pêşgotina Kurdî

Bi vê kitêba hanê cara pêşin e, ku xwendevanê Kurdiaxêv bi zimanê bavûkalên xwe hin nameyên şairê modern yê Alman, Rainer Maria Rilke (1875–1926), dixwîne. Herkesê ku rêya wî bi edebiyata modern ya cîhanê ketiye, bi awayekî navê Rilke bihistiye. Bi vê taybetiya xwe wî ne tenê di kanona<sup>1</sup> edebiyata Almanî de ciye xwe girtiye, ew herwiha di nava kanona şîira cîhanê de jî xwediyê roleke bilind û bala ye.

### Rilke kî ye?

Rilke di 04.12.1875an de li Pragê, ji malbateke Katolik î Alman tê dinê. Dêûbavên wî navê René li wî dikin. Beriya ku Rilke were dinyayê keçikeke wan ya bêmirad çêdibe û hema piştî bûyinê dimire. Ji ber vê jî hetanî şeş saliya wî ew cilûbergên keçan li wî dikin. Rilke di 1881î de li eynî bajarî dest bi mektebê dike. Gava ew dibe neh salî dêubavên wî, ku li gorî gotina Rilke hezkirina wan beriya bûyîna wî nemabû, ji hev diqetin. Piştî vê bûyerê ew di sala 1885an de di dehsaliya wî de wî dişînin mektebên leşkerî – pêşin li St. Pöltenê, dû re li Mährisch-Weißkirchenê. Hetanî şanzdeh saliya xwe ew li van dibistanan dixwîne û dû re bi darê zorê jê diqete. Lê her çi tesîra dibistanên leşkerî ne, ew umrekî dikudîne.

Nivîskariya René Rilke digihêje salên wî yê şagirtiyê. Ew ji xortaniya xwe vir ve dest bi tevlîbûna devûdorên edebî û kovaran dike. Hê di sala 1894an de, nonzdeh salî, ew kitêba xwe ya pêşin ya şîiran diweşîne. Ev cehd û meyla wî ya nivîskariyê – digel ku ew car-caran di bin şertên dijwar yê aborî de dijî jî – hetanî mirina wî dikudîne.

---

1 Peyveke Yûnanî ye. Di disîplinên cihê-cihê de bi me'neyên cihê tê bikar anîn. Berhem û nivîskarên di edebiyatekê de xwediyê ciyekî bin, wek kanona wê edebiyatê tînan bi nav kirin. Mesela, di kanona edebiyata klasîk ya Kurdî de Mem û Zîn, Dîwana Melayê Cizîrî cî digrin.

Ji aliyê xwendina zanîngehê ve tê dîtin, ku Rilke pêşîn dest bi beşên edebiyat, dîrok û hunerê dike, dû re di somestera dudiyar de dev ji wan berdide û xwe di beşa hiqûqê de qeyd dike, ji ber ku apê Rilke wesiyet dike, ku ew buroya hiqûqê ya wî dewam bike. Lê ev daxwaz bi tu awayî nayê cî: Rainer Maria Rilke wek şair, wergêr û nivîskar ji xwe re cihokê vedike; beşa hiqûqê naqedîne û li bajarên cihê-cihê beşên cûrbecûr dixwîne.

Di jiyana Rilke de tesîra gelek şexsan heye, lê ji wan ya herî zêde ya jinika ku çardeh salan ji wî mezintir, tesîra nivîskar Lou Andreas-Salomé ye. Piştî xwendina nivîseke wê, Rilke pê re dikeve têkiliyê û di navbera wan de dostaniyeke dûrûdirêj destpê dike. Ev jinika ku berê bi Friedrich Nietzsche re zewicandî bû, ji aliyê intelektualî ve ewqas zêde tesîrê li ser wî dihele, ku René navê xwe ji bo xatirê wê digihure dike Rainer. Bi saya wê, ew devûdorên nû nas dike û zimanên nû hîn dibe. Rilke bi wê û mêrê wê re di 1899an de diçe Rûsyayê, mêvaniya nivîskarê kal Leo Tolstoy (1828–1910). Ew bi hev ra şeva paskalyayê pîroz dikin û Rilke li ser vê şevê wiha dibêje: «ez bawer im, ew ji bo umreki tîr dike.» (Engel r. 7). Rilke ne tenê nivîskarên Rûsî dixwîne, ew herwiha Rûsî hîn dibe, ji wan wergeran jî dike û gelek caran diçe wir û tê. Têkiliya wî û Rûsyayê hetanî dawiya umrê wi dom dike. Ew di heqê vê de xwe wiha îfade dike: «ji Rûsyayê re di çî de ez spasdar im – wê ez kirim, ev kesê ku ew ez im.» (Engel r. 4).

Elbet ne tenê ziman û nivîskarên Rûsî di jiyana wî de xwediyê rolekê ne. Di serî de Paris û heykeltiraş Auguste Rodin (demekê sekreterê wî bû û kitêbek jî li ser wî nivîsiye); Îtalya, welatên Skandinav, Îsvîçre û hunermend û zimanên wan hetanî dawiya umrê wî bi Rilke re ne.

Rilke ne tenê ji aliyê têkiliyên însanî ve pîr-alî ye. Ew herwiha ji aliyê meraqa ji bo çand û zimanên din jî balkêş e. Almanî zimanê wi yê bavûkalan e û ew di umrê piçûk de Fransîzî die'lime. Û gava mezin dibe, bi gera li welatên cihê-cihê bi awayekî çalak û aktîf gelek zimanên din jî di sewiyeyeke ku ji wan wergeran bike, hîn dibe. Ji

ber vê Rilke ji aliyê hin kesan ve wek «şairê gerok» jî tê bi nav kirin. Rainer Maria Rilke Rûsî, Îngilîzî, Îtalyanî û Fransîzî jî di nav de tam jî heyst zimanan wergeran diweşîne. Di nav nivîskarên, ku ew werdirêne Çexov, Dostojewski, Baudelaire û gelekên din cî digrin.

Rilke xêncî şîiran, kurteçîrokan, drama, romanekê (Notên Malte Laurids Brigge) û gelek nivîsên teorik yên li ser edebiyatê dinivîse.

Rainer Maria Rilke di 29.12.1926an de, nêzikî pêncî û yek salî, ji ber nexweşiya losemîyê wefat dike.

### **Nameyên ji şairekî ciwan re**

Ev kitêb ji yanzdeh nivîsan pêk te: Metna destpêkê ya şairê ciwan Franz Xaver Kappus e. Kappus, nivîskar û şairekî Alman, di vê nivîsa xwe ya kurt de behsa wê dike, ka ev kitêba zirav û bala çawa derketiye holê. Piştî vê girîzgehê li dû hev deh nameyên Rainer Maria Rilke, ku ji wî re şandine, cî digrin. Nameya pêşîn ji sala 1903yan e û ya dawîn jî 5 salan piştî wê, ji sala 1908an e. Nameyên ku Kappus ji Rilke re şandine, tê de cî nagrin.

Rilke nivîskarekî welûd bûye û loma jî xwediye gelek berhemên giranbiha ye – wek *Mersiyeyên Duino* yan jî *Notên Malte Laurids Brigge*. Ka gelo ez ê bikaribim di paşerojê de wan wergerînim Kurdî yan na ez nizanim, lê sebebê ku min ji van nameyan destpê kir ev bû: Ji ber şert û mercên em tê de ne, edebiyateke me ya dewlemend hê çênebûye. Di gelek hêlan de Kurdî hê di destpêkê de ye û edebiyateke pirr-alî (ji hêla cûre, mijar, ziman û hwd.) hê di merhaleya pêşîn de ye. Çawa ku Kappus nû dest bi şîir û nivîskariyê kiriye, herwiha gelê me jî hê di vê qonaxa serî de ye. Bi gotineke din, halê ku Kappus tê de wek mecazek li hal û rewşa me tê, loma jî min xwest em jî wek wî guhên xwe bidin nesîhetên Rilke, da ku bikaribin li ser hîmên saxlem edebiyateke li gorî pîvanên demê ava bikin.

## Çend gotin li ser wergerê

Elbet şêwe û usluba şairekî di nameyên wî de jî dertê holê. Ji ber vê jî wergera zimanê şairekî ne hêsan e. Di zimanê Almanî de bi gelemperî gotin û cumle musaidî dirêjkirinê ne. Gava meriv li metnên Rilke, Thomas Mann, Günter Grass yan jî yekî din mêze dike, meriv dikare bi rihetî cumleyên ji rûpelekê pêk tînin, bibînin. Herçi Kurdî ye, ji vê hêlê ve îmkânên wê mehdûd in. Di wergerê de ji ber vê min carna – gava min ferq kir, ku cumleya Rilke êdî nayê fehm kirin – dawî li cumleyê anî û bi cumleyeke nû dewam kir. Lê heta ji dest min hat, min xwest ez usluba wî biparêzim.

Taybetiyeke van nameyan jî ew e, ku li derên Rilke xwestiye balê bikişîne ser tiştêkî, wî xêzikeke dirêj (–) daniye. Ez bawer im, ev şêwe ne zêde belav e. Lê min xwest bira ev taybetiya wî wenda nebe, loma jî carna di nav du cumleyên tam de ev xêzik xuya dike.

Wekî ku di nameyan de xuya dike, di Almanî de forma xîtabê heye û ew jî «hûn» e. Di Kurdî de di vê hêlê de di van salên dawîn de nîqaşek heye. Digel ku forma «hûn» ji bo şexsekî li pîrraniya herêman tunebe jî û meriv bi «tu/te»yê xîtabî mirovên meriv nasnake bike jî, bi bajarîbûnê û bi tesîra hin zimanên din forma «hûn» jî bo tenê kesekî jî êdî her diçe zêdetir tê xebitandin. Di nameyan de min ev awayê han parast, ji ber ku min nexwest ez tevahiya nameyan li gorî forma «tu/te»yê biguherim.

*Abdullah Încekan*

## Vorwort zur deutsch-kurdischen Ausgabe<sup>1</sup>

Die «Briefe an einen jungen Dichter» von Rainer Maria Rilke (1875–1926) gehören zu den meist rezipierten Briefen der Weltliteratur. Sie wurden in zahlreiche Sprachen übersetzt und fanden insbesondere bei einer jungen Leserschaft großen Anklang. Zwei schreibende Seelen treffen sich öffnend aufeinander. Sie geben so der Nachwelt die Möglichkeit, an ihrem inneren Entwicklungsprozess teilzunehmen und Unterstützung bei der Entwicklung des eigenen literarisch-schaffenden Ichs zu finden.

Diese Briefe ins Kurdische zu übersetzen ist nicht nur vor dem beschriebenen Kontext von großer Bedeutung. Kurdisch gehört auch im 21. Jahrhundert noch zu den weltweit massivst unterdrückten Sprachen. Da das Kurdische auf dem historischen Gebiet seiner Sprecher in der Bildung größtenteils verboten ist, hat «das literarisch-schaffende Ich» umso mehr Probleme, einen eigenen literarischen Weg zu finden. Vor diesem Hintergrund erhoffe ich mir mit dieser Übersetzung ein doppeltes Ziel: Die Briefe sollen nicht nur der Bildung der schriftstellerischen, sondern insgesamt der schriftsprachlichen Kompetenz eines Volkes ohne Bildung in der eigenen Sprache dienen. Zudem mögen sie helfen, eine Brücke zwischen der deutschsprachigen und der sich im Entstehen befindlichen modernen kurdischen Literatur zu bauen.

Rainer Maria Rilke gehört zum festen Kanon nicht nur der deutschsprachigen, sondern auch der Weltliteratur und ist mit seinem Gedicht «Der Panther» und einigen anderen Gedichten in fast jedem Schulbuch anzutreffen. Seine Bücher werden in immer wieder neuen Zusammensetzungen aufgelegt und erfreuen sich einer ungebrochenen Beliebtheit.

---

<sup>1</sup> Die beiden Vorworte stellen keine Eins-Zu-Eins-Übersetzung dar (A.I.).

Rilke kommt am 04.12.1875 in Prag als Kind einer deutsch-katholischen Familie auf die Welt. Er erhält den Namen René, wird jedoch bis zu seiner Einschulung wie ein Mädchen gekleidet, da seine Mutter den frühen Tod der erstgeborenen Schwester nicht verkraftet. Die Zuweisung dieser Rolle wird ihn in seinem späteren Leben stets begleiten. Im Jahr 1881 wird Rilke eingeschult und nach der Trennung der Eltern mit zehn Jahren auf österreichische Militärschulen geschickt. Der militärische Drill quält den musisch begabten, kränklichen Jungen und erst mit 16 Jahren kann er sich lösen. Seine dichterische Tätigkeit geht auch auf diese Jahre zurück. René Rilke – der sich ab 1897 Rainer Maria Rilke nennt – beteiligt sich an literarischen Gesellschaften und bringt mit gerade eben 19 Jahren seinen ersten Gedichtband heraus. Der sich stets als Dichter berufen fühlende Rilke bleibt ein Leben lang diesem Selbstverständnis treu – zum Teil großen wirtschaftlichen Problemen trotzend.

Er beginnt zunächst Literatur, Geschichte und Kunst in Prag zu studieren, bricht ab und beginnt ein Jura-Studium in München, welches ebenfalls abgebrochen wird. Rilke bahnt sich einen Weg als Dichter, Übersetzer und Autor und entwickelt sich zu einem Vertreter moderner Literatur des 20. Jahrhunderts. Literarisch, aber auch persönlich bewegt er sich in einer großen Bandbreite. Er lebt in Deutschland, Frankreich und der Schweiz, Freundschaften schließt er über europäische Grenzen hinaus. Rilke stirbt am 29.12.1926 mit nur 51 Jahren an den Folgen einer Leukämie-Erkrankung.

Die Veröffentlichung dieser Ausgabe verdanke ich der großzügigen Unterstützung des Deutschen Übersetzerfonds. Herrn Jürgen Jacob Becker – Literarisches Colloquium Berlin – bin ich sehr dankbar für seine Ermutigung zur Teilnahme.

Bochum, im August 2021

*Dr. Abdullah Incekan*